


Yên din jî weke
Rûhanî û Ehmedîniyad
Kurdan bi kar tînin
»»» R:7



Maşkanêyek li jêr navê hil-
bijartin di Îranê de
»»» R:4




*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (398) 22-05-2021 Buha (1000) Tûmen

Serok an rêber?
»»» R:5



Çarenivîsa gelê Kurd
di bin metirsiyê de ye
»»» R:8



Hûn di jiyana me
de zîndîtirîn peyva wê dinyayê ne
ez we di nav çeka rizgarîxwaziya şoreşvanên
nav çeperê de dibînim



Dezgeha Ragihandina
Gîştî ya PDKÎ

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî

Di dawî rojên meha Bane-merê de, nûçeyek belav bû ku termeke qetqetkirî li bajaroka “Êkbatan” a Tehrana pay-texta şariştaniyeta “Pehlewî û Wilayeta Feqîh”, hatiye dîtin û piştî derkevt ku ew termê qetqetkirî yê derhênerê Fars, “Babek Xuremdîn” e ku bi destê bav û dayîka wî hatiye kuştin.

Cenab Serhengê malnişînkirî, Serheng Xuremdîn, di hem-ber dadwerên bêdadgeha Komara Îslamî ya Îranê de îtiraf kiriye ku wî digel hevjinê xwe, kurê xwe kuştine.

Heta niha wekî tawanek bi sam a kesên nesax ên psîkolîjîk tê berçavê min ku rege çendîn caran li her kuncêke cihanê de qewimî bin û dayîk û bav ku tûşî nexwşiyên psîkolîjîkî dibin, zarokên xwe kuştibin. Mînakên wekî wê mijarê ku pîrsgirêkeke psîkolîjîk hene gelek in ku di welatên cihanê de gelek çîrok û fîlm jî, jê hatine berhemanîn.

Lê eva ku cenabê Serhengê sîstema paşayeti û Wilayeta Feqîh kiriye, neku li çarçoveya tawana kesek nexweş de nîne, belkî her wekî dadwerê rejîmê gotiye, cenab Serheng di warê psîkolîjîkî de gelek jî tendirust e.

Di wê tawanê de du krîzên kûr ku welatê Îranê kiriye di nav qûbiyê de tene xuya û aliye rizî û genî ya kultûrî û sîstematîk a Îranê di bin bandora Pehlewî-Xumeynî de nîşan dide.

Cenabê Serheng û hevjinê na wî, ne tenê kurê xwe kuştibûn, belkî keç û zavayê xwe jî, di salên derbasbûyî de kuştibûn û jî nû ve îtiraf

Hawara mirinekê

bi wê tawana xwe kirine û di wan tawanan de, ne bi sedema rewşa psîkolîjîkî, belkî bi sedema zêdexwazî û mezinxwaziya hizra hovaneya şîwênîstî ya wan, wa hizir kirine ku keç û kur û zavayê wan, bûne sedema şerim û şikeştina rûmeta wan bo xwîn û kultûra bavên wan ku bawerî bi “Mam Mîhen” hene û her wekî ew salên ku di nav hêzên leşkerî de bi navê “Mamê Mîhen” xelk dikuşt û niha seba “xwîna paqij”! Zarokên xwe qetqet kir! Ew aliyeke din ji hizir û kultûra rizî û genî ye ku mirov li ber çavên wî tene reşkirin û xeyala şariştaniyeta kevin û çewt bi cihê wê dadinê û di wan deman de, rehmê bi zarokên xwe jî nake!

Aliyek din a riziya wê karesate eva ye ku hekî dadgeha Komara Îslamî bi sedema kuştina kurê wan cezayê bi wan bikujan re bide, bav wekî bikujê serekî bi tenê 3 salan girtîgehê tê cezadan û dayîka wî jî wek alîkar bi 15 salan girtîgehê tê sizakirin!!

Bav dikare kurê xwe bikuje çimkî pêka yasayên “Wilayeta Feqîh”, “Weliyê Dem” û tenê bi 3 salan tê cezadan û dayîk jî bi sedema wê yekê ku jin e, herçiqas ku tawana wê alîkarîdan e û kêmtir e, lê cezaya wê girantir e û 5 beranberê bav tê cezadan!

Tenê mirineke wiha dikare bi dengeke bilind hawar bike û darê li qûbiya mezinxwaziya “Wilayeta Feqîh” rake û bêhna wê ya genî, hemû dinya seh pê bike, hekî ne bi 10an sal di bin peyv û silogan birisqî de wan vedêşere û mirovatî jî bi 10an salên din li welatê belalêketiyê Îranê de, dê janê bikêşe.

Navenda Hevkarî: “Cihê dengdanan li Rojhilatê Kurdistanê divê ji hemû cihên Îranê zêdetir çol bin”

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê daxwaz ji xelkê azadîxwazên Îranê bi taybet Kurdistanê dike ku hîlbijartinên Serkomarî û Şêwraya gund û bajaran baykot bikin û bi beşdarînekirin û bi çolragirtina sindoqên dengdananê, wê hîlbijartinê bikin bi rîfrandoma “NE” bi Komara Îslamî û hemû cinayet û gendeliyên wê.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:

Daxuyaniya jimare 1 a Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê li ser binav hîlbijartinên Komara Îslamî ya Îranê.

Gelê zulimlêkirî yên Îranê

Azadîxwaz!

Xelkê xweragir ên Kurdistanê

Komara Îslamî ya Îranê li meha Cozerdana sala 1400 a Rojî de, bo careke din şanoya binav hîlbijartinên xwe dê bi rê ve bibe. Ew di halekê de ye ku rewşa aborî, siyasî û civakiya Îranê li dîroka gemar a Komara Îslamiya li xirabtrîn ast xwe de ye.

Birêvebirina seqet û naberpirsane ya aboriya welat, gendeliya jiaşderketî ya berpirsên wê rejîmê û dorpêçên aborî, Îrana di bin deşthilata Komara Îslamî de aniye ser lêva veresîngehê. Ew rewş roj bi roj ji aliyê tax û qatên cuda ên wekî xelkê hejar û mafjêxwarî yên Îranê ve zêdetir tê sehkirin. Li siyaseta hundir û derve de, karbideştên Komara Îslamî domê bi lîstoka derdayî didin û henek bi can û mal û jiyana xelkê Îranê dikin û bi domandina siyaseta xwe yê çewta navkî û deştêverdan li karûbarên hundir ên li welatên dever û cihanê, hemû welatên cihanê kirine bi dujminê xwe di nawxwe de jî roj bi roj xeleka dostên rêberiya Komara Îslamî û nêzên deşthilatê bertengtir dibe. Girtin, îdam, teror, îşkence û tirsandin, beşeke

hertim a şewaza deşthiladariya wê rejîmê ye.

Di vê navberê de, rejîma Îranê her carê şanoyeke nû dilîze û dixê ber çavê civaka cihanê û xelkê Îranê, hîlbijartin çî bo meclîsa Îslamî an şewraya bajaran an çî bo Serkomariya Îranê be, ti pêwendiyek digel wê hîlbijartinê azad ve tinîne ku li cihana azad û demokrat de xelk bi rê ve dibin û hîlbijartin li Îranê bi tenê şanoyek bona xemilandina rûkê dîktator û serkutker a rejîmê ye.

Di hemen demê de ku Komara Îslamî bi rêxistina wan şanogerayane hewl daye ku hejmareke zêdetir ji xelkê bo ser sindoqên dengdanê rabikêşe û wê mijarê wekî piştevaniya xelkê bo nizama siyasî bide nasîn û bi hizra giştî ya cihana derve û beşek li xelkê navxwe bifroşe.

Terora kesayetî û şerê deşthilat gihîştîye asta xwe ya herî bilind û demûdezgehên ewlehî û leşkeriyên Komara Îslamî her rojê derzeke nû lêdikeve. Nifûz û têketina welatên derve heta kûrahiya hundirê ewlehî, leşkerî û operasyonên rejîma Îranê wekî teqandina cihên berhemanîna Uraniyom heta biderxistina 100an û hezaran belgeyên nihênî yê dewletê ku heta astekê ku tev nihênîyên leşkerî û hikûmetî yê rejîmê êşkerekirine û êdî ti tiştê bona veşartinê nemaye.

Ji aliyeke din ve, hejmara wan kesên ku hêj baweriya wan bi rejîmê maye, li nizmîtinê asta xwe li tev dîroka Komara Îslamî de ye.

Serkuta xwenîşandanên salên 1396 û 1398 ên Rojî, çewtekarî û xelitandinên li hember xistinexwarê ya balafira rêvîngî ya Ukraynê li 18ê Befranbar a sala 1398an li esmanê bajarê Tehranê, xemariya li hember berbelavbûna vîrûsa Covid 19 û xisarên canî û malî yê xelkê hejar, êdî ti cihek bona bawerîpêkirin û dilxweşî bi propagen-



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

deyên rejîm û hikûmetê bona beşdarîkirin li hîlbijartinan de nehiştîye. Li dawî rapirsiya ku rejîma Îranê bi xwe belav kiribû, dibêje ku bi tenê %30 a xelkê dê beşdarê wê hîlbijartinê bibin. Herçiqas ku ew amargitinane jî wekî gelek tiştên din li welatên dîktatorî û keşûhewayeke dayxistî de bi rê ve çûye û şiyana derxistina hemû raştîyan tinîne û wa xuya dike ku rêjeya beşdarîkirin li hîlbijartinan de, dê gelek kêmtir ji wê amarê be, lê îtirafkirina bi wê yekê, her bi xwe cihê balkêşandinê ye ku ji aliyê demûdezgehên rejîmê bi xwe ve tene gotin.

Xelkê xebatkar ên Kurdistanê!

Asta nerizayetiya xelkê heta ku dem derbas dibe zêdetir dibe û xelk bi tewawî ji wê rejîmê bê hêvî bûne û nerizayetiya giştî û bi kom êdî tenê taybet bi netewên bindest ên Îranê nîne û hemû tax û qatên civaka Îranê li xwe girtiye. Nerizayetiya li wan salên dawiyê de ku xelk li ser hewcehî bi nanê şevê dabûne xuya, wê raştîyê dide berçav ku li derheq asta jiyan û bijîva xelkê de heta çî astekê Komara Îslamî û deşthilatdar bikêrnehatî û naberpirs in.

Xuya ye ku rewşa Rojhilatê Kurdistanê ji beşên din ên Îranê xirabtir e. Xelkê Kurd tevî cudatîdanina aborî ku li ser de hatiye sepandinê û ketiye bin givaşê zêdetir, li hemû warên dinê de jî di bin givaş û cudatîdanînan de ye. Ji bîra me neçe ku Serkomarên berê her carê bi sloganên nû û sozên cor bi cor hewl dabûn ku xelk bo ser sindoqên dengdanê rabikêşin û piştre bersiva wan bo xelkê Rojhilatê Kurdistanê gulle,

bendikê sêdarê û girtîgeh bûye.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê piştî berevirdkirin û lêkolîn li ser rewşa îro ya Îranê û deverê, gihîştine bi wê encamê ku beşdariya xelkê li hîlbijartinên wê carê de jî wekî carên berê ti deştkevt û qazancekê bo xelkê tê de nabînin û tenê dibe emrazê propagandeya Komara Îslamiya Îranê bo wê yekê ku di nav xelkê de rewayî heye. Ji vê zêdetir, beşdariya xelkê li wan hîlbijartinan de jî dibe alîkarî û hêcetdan ku ji hemû caran serkuta zêdetir, îşkenceyên zêdetir û îdamên zêdetir bikin û wazjoya pesendkirina kiryarên Komara Îslamiya Îranê ye.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê daxwaz ji xelkê azadîxwaz ên Îranê û bi taybet Rojhilatê Kurdistanê dike ku hîlbijartinên serkomarî, şewraya bajar û gundan baykot bikin û bi beşdarînekirina xwe li wan hîlbijartinan û bi çolhiştina cihên sindoqên dengdanê, wê hîlbijartinê bikin bi rîfrandoma dengê “NE” bi Komara Îslamî û hemû cinayet û gendeliyên wê.

Ji dîtingeha me ve, bi tenê deng nedana “takekan” bes nîne, belkî hemû takên civakê dibe bibin bi trîbûna “Ne” bo hîlbijartinê û hemû aliyek bi hev re bona baykota çalakane ya hîlbijartinên wê dewreya Komara Îslamî û bi xwe ve bîn û pûçbûna rejîm û rewatiya wê bi tewawî bo hemû cihanê êşkerekirin û bi wan bidin selimandin.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê

7`ê Gulana 2021`an

Maşkanêyek li jêr navê hilbijartin di Îranê de



N: Nûredîn Sofizade

Her wekî xuya ye rejîma Îranê dixwaze bo cara 13'emîn şanogeriye bona diyarîkirina Serkomariyê di Îranê de bi rê ve bibe.

Li gor daxuyaniyan û helwêştan eva heya niha êşkere bûye, ew binav hilbijartine ji aliyê hemû hêz û aliyên siyasî ên dijberê rejîmê û pêla berfireh a çalakvanên navxwe û piraniya xelkê Îranê û qatên cuda-cuda ên welat û bi taybetî gelê Kurd û hêz û partên siyasî yên Kurd û tevgera rizgarîx-wazî ve hatiye baykorkirin û daxwaz tê kirin ku kes di wê hilbijartinê de beşdariyê neke.

Di wê nivîsê de ezê cehdê bikim ku ew sedemên ku dibine hegera baykota bi wî awayî berfir a ku nabe xelk beşdariyê bike, diyarî bikim.

1- Di nava sîstema wê rejîmê de bi taybetî bona danîna Serkomar, deng û raya xelkê çi nirxek tinîne, tenê rejîm dixwaze bi beşdariya xelkê li ser sindoqan, piropagendê bo derveyê welat bike û wisa bide xuyakirin ku deshilatdar bi dengê xelkê û ji rêka hilbijartina azad û demokrasîyê ve tene diyarîkirin.

2- Serkomarê rejîmê berî vê ku xelk dengê bidin û rejîm şanoya hilbijartinê bi rê ve bibe, ji aliyê "Weliyê Feqîh" û Şêwra Nobedar ve hatiye diyarîkirin. Di nava sedan kesên de ku xwe berbijêr dikin, bi biryara Xamineyî û ji aliyê Şêwra Nobedar ve, "selahiyeta" (jêhatiyeta) 2 an 3 kesên cihê pejirandina rejîmê tete erêkirin û ew sedan kesên dinê "selahiyeta" wan tete

redkirin. Ew jî nîşana hindê ye ku rejîm dibêje xelkê min Serkomar diyarî kiriye û tenê hewce ye hûn bîn û deng bidinê.

3- Di Îranê de û di nava sîstema wê rejîmê de û li gorî yasaya bingehîn a rejîmê, tenê ew kesê dikare bibe Serkoma ku bawirmendê Ola Şî'eyê 12 Îmamî be, ew jî dibe sedem ku hem bawirmendên Olên dinê wekî Sunnî, Mesîhî, Ermenî, Zerdestî, Behayî, Yarsan, Aşûrî, Yehûdî, û heta 3ê li ser 4 a xudê Şî'eyan jî, ji wî mafî bêpar dimînin û mafê bûn bi Serkoma tinînin. Ku wisa ye Serkoma di Îranê de nikare Serkomarê hemû pêkhatayên Îranê bike û ne xeyrî Şî'eyên 12 Îmamî kes wî bi Serkomarê xwe dizane, ne jî Serkomar xelkê xeyrî kesên ku bawerî bi Şî'eyên 12 Îmamî û peyrewên esla "Wilayeta Feqîh", xelkê dinê bi xudî û xelkê xwe dizane.

4- Di bin deshilata rejîma Îslamî de û gorî yasaya bingehîn a wê rejîmê, Serkomar dibe "Mêr" wate nêrza be û bi awayekî yasayî "Jin" ku renga nivîya heşîmeta Îranê pêk tînin, ji wî mafî bêpar kiriye.

5- Di Îranê de xencî netewa deshilatdar "Fars" ti kesên dinê nikare bibe Serkomar, ew jî bi vê wateyê ye ku

Kurd, Belûç, Erebb, Azerî, Tirkemen û Ji wî mafî hatine bêparkirin, ku wisa ye Serkoma her çawan tenê dikare Fars be, her bi wê qasê jî dikare tenê Serkomarê netewa xwe be û ne netewên xeyrî fars, wî bi serkomarê xwe dizanin, ne Serkomar xeyrî Farsan, netewên dinê bi xudî dizane.

6- Serkomar di Îrana bin deshilata wê rejîmê de dibe xwediyê wan taybetmendiyan be, Mutedeyîn be, Rêdîn Hebe, nav eniya wî li ber mora nimêjê reş bibe, di heyamê temenê xwe de xizmetkarê rejîmê bibe, Pasdara be, li şer û tepesiya li dijî xelkê Îranê û bi taybetî destê wî bi xwîna netewên bê maf sor bibe, kes yan kesaneke ji malbata wî li pêxema rejîmê de hatibine kuştin, barî esla Wilayeta Mutleqe a Feqîh hebe, û bi giştî destê wî heya enîşkê bi xwînê sor bibe û beşdarî li teror û cinayetên de kiribe.

7- Serkomar ger çi di Îranê de wekî birêveberê dezgeha birêveberî tete nîşandanê, lê di eslê xwede Serkomar tenê leyîstok û emrazekî bê deshilat e li ber destê Weliyê Feqîh de, ku Weliyê Feqîh jî xwe bi nûnerê Xwedê li ser erdê dizane û xelkê Îranê bi temamî li diyarîkirina wî de ti rolek tinînin. Bo

piştraştîkirina vê gotina xwe jî, em dikarin îşarê bi gotina Mihemed Xatemî, Serkomarê berê yê rejîmê bikin ku gotibû: "Serkomar di Îranê de ti tiştê ji destê wî nayê û nabe xelkê çavniherî jê hebin, Serkomar tenê "tedarokatî" ye li ber destê rêberê rejîmê de".

Di demekê de ku xelkê çarereş ên Îranê di bin deshilata wê rejîmê de û bi hegera siyaseta dijminkarane ya wê digel xelkê Îranê, ku rejîmê gorî wan xalên jorîn hatine nivîsîn, xelkê ji xwe nizane, eva rojreşî be bi ser xelkê de aniye, xelk bi hegera siyaseta dijminkarane yê wê rejîmê, rastî betalî, bîrsîtî, belengazî, dehan diyardeyên xirab ên civakî, ên wekî nebûna azadî, tepeserî, girtin, sêdare, girtingeh, derbiderî, derkevtin ji welat, û ... hatine, ne tenê naçin û beşdariya wê maşkanêya rejîmê nakin û rewayiyê nadine wê rejîmê, belkî dibe bona nehêlan û jinavbirina wan hemû rojreşîyan xebatê bikin, ew jî di demekê de, dê hasil be ku rejîma dijminê xelkê Îranê sernixûn be û ji nav biçe.

Beşdarî nekirina xelkê li şanogeriya rejîmê de, dikare zenga yekim be bona jinavçûna wê deshilata diwîn û dîktator.



NA BO DENG DAN



N: Bêhzad Qadiri

W: Keyhan Mihemedînjad

Diniya ber bi guherînê ve diçe; Ev serdemên ku serokan bi qamçî û lêdan karên xwe ber bi pêş ve dibirin, derbas bûye. Di niha de hin şirketên wekî “Appel, Google, Facebook, Amazon û Tesla” ev yeka nîşan dane, ku divê me dîtingeheke cuda li derheq dinyayê hebe. Divê li cihê serokayetî, rêberayetiye bikin. Divê li cihê hawarkirin, hevxiyê bikin; Di wan haletane de xelk peyrewiyê ji me nakin, çimkî neçar in, lewma ev peyrewiyê ji me dikan, çimkî wan bi dil ve pê xweş e.


Diniya bi vî yekê giha ye ku ew şeweye qazanca wê ji birêvebirina girûp zêdetir e. Hin fermanber ku bi vî rengî tene arastekirin, dahênertir, baştir û dilxweştir kar dikan û di encamê de wan nêrx- eke zêde bo rêkxirava xwe hene. Em dikarin girîngtirîn cudahiye rêber û serok di yek hevokê de bas bikin: “Endamên girûp di çavên rêber de mirov in, lê fermanber di çavên serok de hevşeweyê maşîn in”.

Pişt û penah wek çiya

Fermanber di rêkxirava xwe de ditirsin ku karên xwe ji deşt bidin; Ditirsin ku serok ji karê wan razî nebe; Fermanek diyarîkirî tê li ser maseyên wan û her heman tiştê cî bi cî dikan. Ev dibêjin, ku em ti kare ne û em tenê mûçe werdigrin û fermanan cî bi cî dikan, hekî berevajiya vê be dê ew, me li ser kar vêde bibin.

Lê rewşa peyrewên rêber cuda ye; Ev ti caran nabêjin ku em ti kare ne, çimkî rêber ti carî hewil nedaye ku wan sivik û şerminde bike; Ev

Serok an rêber?



xwe wekî kesek ku tenê mûçe werdigrin nabînin, belkî ji bo rizamendiya hemberê xwe her karek ku guncaw be dikan, çimkî dizanin rêberê wan wek çiyayekê li pişt serê wan rawestaye. Rêber bawerî bi endamên girûpa xwe heye, deştilat û azadiyê dibexşe wan û îzinê dide wan ku bo çareserkirina arîşeyan wan dahênerî hebe.

Tirs an netirs

Tirs yek ji girîngtirîn emrazê karê serokan e; Ev bi berdewamî we ditirsînin, ji hemû tişteke we ditirsin; Lê rêber netirsiyê dibexşe endamê girûpa xwe, îzinê dide wan ku hin caran şaşiyên bikin, lewma endamên girûpê dizanin ku hekî bo heyameke kurt bi awayekî guncaw nemeşin, dúbare dikarin xwe rêk bixin û bi başî karên xwe derbas bikin.

Nigeranî an şanazî

Serok hewil dide ku hizrên baş ên fermanberên xwe bi navê xwe tomar bike. Lê rêber hewil dide ku wê heştê bi girûpa xwe bibexşe ku ew bixwe bi wê hizrê gihane, heta ger xwedî rêber jî hizra wê/wî hatibe rûkirin. Rêberê rasteqîne şanazî bi serkevtina girûpa xwe dike; Dema ku yek ji endamê girûpa wê/wî bi ciwanî karê baş û ciwan dike, ew rêbere nigeran nîne ku xelk bêjin, serkevtina girûpa wê/wî bi sedema karê ciwan ê filan kesê/î bûye, belkî şanaziyê bi wî/wê kes û xalên bihêz ên wî/wê dike.

Fam û têgihîştin

Rêber têdigihe, fam dike û dizane ku fermanberê wê/wî mirov e û mirov şaşiyên dike, mandû dibe, rojên baş û xirab heye, nexweş dikeve û hin caran jî tûre dibe; Qirar nîne ku ew fermanbere hertim wek maşînekê bigihe bi hemû erkekê û eva mijarek bi tevavî surûştî ye.

Hertimî li ser kar hemû tişteke ji rûyê bername ve naçe pêş; Bo mînak biryar nîne fermanber bi hemû vizeyê ve li pişt maseyê be û heta bo bîstekê jî çavê xwe li ser kampiyûtirê raneke. Serok dibêje te ku çî bike; Rêber dibêje ku çawa kar bike. Rêberên mezin ên cîhanê jî vî jî derbas bûne, ev dibêjine me: “Bo çî divê em kar bikin? Bo çî divê em ji xewê rabin? Bo çî divê em di hember dijarî û zehmetiyan de xweragir bin?”.

Helbet hewce nîne ku rêber hemû tişteke bizane, lê rêber hewil dide ku rewşekê biafirîne ku endamên girûpa wê/wî hîn bin, pêş bikevin, mezin bin û ser bikevin. Dema ku fermanber bibînin ku di karê nû de geşe dikan û pêdigihihî û ev geşeye rastevxwe li ser wan bandoreke pozetîv heye, girîngiyek zêdetir bi rêkxirava xwe didin û emegnas jî dibin. Ev ji dil ve peyrewiyê ji ferman û rênimiyên rêberên xwe dikan û bi baştirîn şêwe karên xwe derbas dikan.

Gelo li Bakurê Kurdistanê heya çi qasekê gelê me agehdarê Xebata Hizba Demokrat?

N: Zaniyar Amedî

Kurdê bakurê Kurdistanê, bi awayên cuda bi komikên partî û rêxistinên hatine polîtîzekirin. Ew tesîra jihevkirina polîtîzekirinê, azadiya ramanên kesane di wan de hatiye windakirin. Wan hizra xwe bi rêxistinên dahine girêdan. Jiber vê yekê, qet cuda nafikirin û gelek caran rastîyên derdora xwe nabînin. Carna bûyerên ku ber çavên wan jî werin encamdan jî, ew rastîya wê bûyerê ber çavan nanirxînin. Bêguman ew pirsgrêkek psîkolojîk a bê derman e di nav part û aliyên siyasî yên Bakurê Kurdistanê de. Di wî warî de, gelek nivîskarên Kurd hene ku mixabin gorî hizra xwe û bi bê berçavgirtina pîrsa netewî mijaran gorî hizra xwe dinirxînin. Gelek caran ev nivîskar bi kirasê bîrdozîyên dijminan jî, erkên xwe bicî tînin, bi bê vê ku bizanin nivîsîna wan çiqas derbê ji hizra netewî dide. Rastî dîyar e ku li Bakur pirsgrêka nivîskari/rewşenbîrî heye.

Bêguman hemberî wê siyaseta han, Kurdên neteweperwer û nivîskar û rewşenbîrên paqij jî, rastîyan tînin ziman. Rexne û teşhîrkirina me ji bo wan kesa ye ku hizr kiryarên wan ne di xizmeta doza gelê wan de ye.

Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ji damezrandina Komara Kurdistanê ve heta niha, bi şoreş û şer li hemberî dewleta Îranê tekoşîna demokrasî dimeşîne û mafê netewa Kurd diparêze, wek mînak demokrat bi pêşmerge hebûye û heye. Li ser wê xebata dûr û bi şanaz de, bi qahremanî û fedakarî jî hemû Kurdan û deskevîyên Kurdistanê, gel û axê re xwe kirîye cangorî. Bandora şoreşa Hizba Demokrat ne tenê li Rojhilatê Kurdistanê ye, bi gelek fedakarî li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî erkdar bûye û erkdar e. Li Bakur hertim piştevaniya xebata netewî kirîye. Herweha li Rojavayê Kurdistanê



jî dîyar e. Parastina deskevîyên Başûrê Kurdistanê, wek xebata xwe dîtîye û parastîye. Ji bo evê ku şerê wê bi dijî rejîma Îranê re nebe derfet û hêncet ku, Îran têkeve nava axa Başûrê Kurdistanê şerê xwe yê çekdarî li Rojhilatê Kurdistanê bo heyamê nêzî 20 salan rawestandin. Li çîyayan, pêşmerge neman daketine kûratiya başûrê Kurdistanê, di wê biryara heşt bi berpîrsayeti û xwedî derkevîtin ji deskevîyên gelê Kurd li Başûr, Hizba Demokrat rola xwe ya fedakarî lehîst û divê hertim gelê me vê yekê pê bizane.

Valahîya hebûna Pêşmerge li Rojhilat, ji dewleta Îranê re bû propaganda derewîn û vala. Hevdem propaganda dewleta Îranê ev bû ku li piştî terora rêberên Hizba Demokrat, Dr. Qasimlo û Şerefkendî, pêşmerge hemberê hêzên Îranê tîk çû, hizib nemaye. Bi salan hemberî xelkê Kurdistanê ev propagande dikir. Dixwest parêzvanên Kurdistan û hêvîyên gel an ku pêşmerge di nav hişê gel de derxe û ji doza netewî dûr bixe.

Piştî ku alozîya Rojhilata Navîn kûr bû, ew alozî ber bi Îranê ve jî çû, û ji bo pirsgrêka Kurd derfet çêbû. Di wê qonaxê de “Rasan” hate ragihandin û xebata çekdarî/medenî careke dinê ji nû ve hizûra Pêşmerge di Rojhilatê Kurdistanê de dom kir û wê qonaxa xebata PDKÎ li Rojhilatê gelek bandor hebû

û careke dinê îrada xebata rizgarîxwazane û netewî di nava gel de zindî kir û li hemî cîhanê de jî deng weda û bandor hebû.

Di wê qonaxa xebatê de, çawa xebat li “şax û şar” des pê kir. Dewleta Îranê jî dev ji propaganda derewîn û vala berda û hemî gotin û siyaseta wê ya çend sale bûne bilqên ser avê. Careke din tirs kevte nava rejîmê. Dewlet bi hemû hêza xwe ve, xwest hemberî xebata pêşmerge derkeve. Hêza xwe ya çekdarî li Rojhilat bi hêz kir.

Di wê qonaxê de gel û pêşmerge bûn yek. Gel li bajar û gundan de dilê xwe ji pêşmerge re vekir. Pêşmerge bi îradeyekî polayîn derkete nava gel û her cihekê hewce bû şerê xweparastîyê û rewa kir û carekê dinê çalakiya pêşmerge bû rojeva siyasî. Li minasibetên weke Newroz û bîranînên taybet, gel da xuyakirin ku bi hemî rengî digel Pêşmerge ye. Herweha digel despêka wê qonaxa xebatê bi tevlîbûna ciwanên şoreşger, pêşmerge bihêz bû. Bi kurtî em bêjin xebata hizbê, têrî bingeha desthiladarîya gel û Kurdistanê ye. Niha jî bi Hêza Pêşmerge û îrada gel bi awayê cuda-cuda ew qonaxa nû ya xebata Rojhilat bi pêşengiya PDKÎ dimeşe û roj bi rojê xort dibe.

Lê eva ku bêtir mirov dêşîne eva ye ku li perçên din ên Kurdistanê û bi taybet li

Bakur de giringî bi xebata Rojhilat û PDKÎ nehatiye danê û bi awayê hewce nayê dîtin. Her çawan gelê me li Bakur wisa difikre ku hewce ye gelê Kurd li perçên dinê ji xebata wê xwedî derkevin, bê guman xebata Rojhilat jî ew çavniherîye ji Bakuriyan heye. Li Bakur ew kesên ku ji xwe re dibêjin nivîskar, ne tenê xebata Rojhilat û parên dinê yên Kurdistanê nabînin û basê jê nakin, belkî mixabin gelek caran hin kesên binav Kurd peyda dibin ku hemen peyvan li ser xebata Kurd li Rojhilat dibêjin û dinivîsin ku tenê dijmin wan gotinan bi dijî gelê me û xebata berheq a wê bikar tîne. Gelek caran dibêjin: Hizba Demokrat lawaz bûye, nikare bikeve çîya, bi şehîtkirina Dr. Qasimlo û Şerefkendî Hizib nema parçe bû, nikare çalekî bike, gel xwe ji hizbê dûr digre, di bin bandora Başûr de ye, nikare tiştek bike... Ev kesên ku rejîma Îranê dinasin, bê guman dizanin ew gotin bi dijî tevgera Kurd li Rojhilatê hemî gotin û pîrûpagenda rejîmê ne û ez bawer im her Kurdek jî wan gotinan bike bila kesê şik çinebe ku girêdayê rejîma Îranê ye.

Emê ji wan nivîskar û rewşenbîrên ku kevîne ser wê hêla şaş û li dijî xebata gelê xwe derkevîne pîrs bikin, erê gelo başe ger Kurdek eva dujmin li ser we dibêje, wê gotina dujmin ducarî bikî?

Nerîna Lîderan



“George Bush”:
“Rejîma Îranê li pey jinavbirina rêkvektina “Îbrahîm” e”.



“Ilan Berman”:
“Piştewanî ji xelkê Îranê bo bideşt-veanîna demokrasî, kilîda aştiya Rojhilata Navîn e”.



“Linderking”:
“Îran ti hewleke erênî bona bi dawîbûna şer li Yemenê nade”.



“Hesen Rûhanî”:
“Rêkvektina sereke bo vêdebirina tehrîmên zêde yên Amerîkayê li dijî Îranê hatiye encamdan û doma danûstandina li Vîyenê li ser hûrdekariyan e”.

Yên din jî weke Rûhanî û Ehmedînîjad Kurdan bi kar tînin



N: Eskender Ceiferî

Hilbijartinên rejîmê nêzik dibin û bazara xapandina welatiyan jî li Îranê germ dibe. Lê neteweyên ne Fars û di seriya wan de jî Kurd, hay-dartir li mijarê nêzik dibin.

Kurd her ji destpêka hatina rejîma Komara Îslamî ve, dijberên rejîmê bûne û piraniya xelkê Kurdistanê, li gor biryara partiyên siyasî qet dengên xwe nadin rejîmê.

Çalakvanên Kurdistanê Rojhilat, mînaka herî berçav ya nedana azadiya neteweyan, girtin yan jî rênedan bo weşandina herî kêm 15 kovar, belavok û heftenameyên Kurdî tînin ku di serdema Hesen Rûhanî serokkomarê niha yê rejîma Îranê de hatine encamdan.

Ew amaje dikin bûdceya saziyeke navçeyî ya ser bi rêxistinên ewlehî û îstixbaratî yên Îranê ve ku ji bûdceya çap û weşana Kurdî zêdetir e. Tenê ew pirtûkên Kurdî û ew rojname bi bûdceya dewletê derdikevin, yên ku di berjewendiyê rejîma Tehranê de ne.

Mehmûd Ehmedînîjad jî weke Rûhanî serokkomar bû. Ne çar salan lê heşt salan. Aştî azadiyê li wî welatî herî kêm kiribû. Lê dîsa jî hin Kurd peyda bûn beriya ku navê wî derkeve yan jî bê redkirin, bi kincên xwe yên bav û kalan, propagende ji kesekî re kirin ku hukma darvekirina sedan ciwanên Kurd di serdema serokkomariya wî de hatibûne dayîn.

Li vir behsa redkirin yan jî erêkirina serahiyeta berendam ji aliyê rejîma Komara Îslamî ve nayê kirin. Lê belê behsa baykotê û beşdarînekirin di proseya dengdanê de germtir e.

NA BO DENG DAN



Opozîsyona Îranî jî, ji ya Kurdan cuda ye. Hin ji wan baykota hikbijartinan dikin, hinek bêdeng in û hin jî beşdar dibin. Lê partiyên Kurdî yên Rojhilat, dengêkî cuda hene. Ew ji serdema Dr. Ebdulrehman Qasimlû ve ku ji aliyê Komara Îslamî ve hate terorkirin, hemû hilbijartinan baykot dikin. Herî dawî çar partiyên Kurdistanê Rojhilat bi bîr tevlikerîna aliyên ku netewî nîn in yan jî di şanfina biryarê de serbixwe nîn in, di daxuyaniya xwe de di derbarê hilbijartinên serokomarî û encûmena gund û bajarên Îranê de biryara boykotkirinê dan. Wan aliyên ragihandin ji ber ku ew hilbijartin di rewşeke xeyrî demokratîk û ne azad de tene lidarxistin, ewê wan boykot bikin. Ew dibêjin ne di hilbijartiyan gund û bajarên de û ne jî di ya serokkomariyê de, berendam bi şeweyek demokratîk neketine holê ji ber ku serahiyeta kesên dijberî Komara Îslamî tê redkirin. Her wiha wan aliyan ji Kurdên wî perçeyî jî xweştin ku roja hilbijartinên wî welatî neçin ser sindoqan û dengê xwe bi kar neyinin.

Di hilbijartinên gerra berê de, ew şeş alî bûn ku di Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê de beşdar bûn. Navên wan, Partiya Demokrata Kurdistanê Îranê (PDK-Î), Partiya Komunîsta Kurdistanê Îranê, Komeleya Zehmetkêşanên Kurdistanê, Hizba Demokrata Kurdistanê (HDK), Komeleya Şoreşger a Zehmetkêşanên Kurdistanê Îranê û Komele-Rêxistina Kurdistanê bûn.


Hin partiyên biçûk jî ku di şandina biryarê de serbixwe nîn in di hember de dibêjin ew ji bo demokratîzekirina Îranê kar dikin û hêj hilbijartin baykot nekirine lê ragihandine eger Îran derfê ji bo guhertinan pêk bîne ewê beşdar bibin. Lê ew çar aliyên Navenda Hevkarîyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê dibêjin berendam ji filteran derbas bûne û ti yek ji wan serbixwe nîn in da ku bi karibin mirovên azadîxwaz yan jî demokrat bin.

Eger lixwekirina kincên Kurdî ji bo wan kesan tê qebûl kirin ku propagandeyê ji bo berendamên dikin, lê bi ti awayekî ji bo jina ku dixwast bi kincên Kurdî here Wezaretê Navxwe da ku navê xwe weke berbîjêr tomar bike, nayê qebûl kirin.

Eger derxistina ştrênê Kurdî di beşa mûzîka zanîngehan de nayê qebûl kirin, lê ji bo wan hunermendan qebûl kirî ye ku bi ştrênê Kurdî propagandeyê ji bo berendamên hilbijartinan dikin.

Partiyên ku ew hilbijartin baaykot kirine, didin xuyakirin ku take rê ji bo demokratbûna Îranê û ghiştina Kurdistanê bi mafên xwe, guhertina sîstema Îranê ye û li gor ku ew dibêjin, di yasaya binge-hîn ya wî welatî de ne mafê jinan parastî ye, ne yê kar-keran, ne jî ol û neteweyên cuda. Ew dibêjin eger em libenda guhertineke binge-hîn di çarçoveya Komara Îslamî de bin, dişubhe kesê ku li ser kaniyeke hişk û zuha, libenda avê ye.

Çarenivîsa gelê Kurd di bin metirsiyê de ye



N: Ebdulazîz Qasim

“Rojek dê were (ji xeynî welatên Rojhilata Navîn) wê tevaya cîhanê li gel doza Kurdî û gelê Kurd bisekine, û doza Kurdî wê bibe dozek navnetewî, lê gelê Kurd li hember wê bi xwe yeknegirtî û ne amade be û ji nezanî û yeknerêziyê wê fersendeyek herî mezin ji bo bidestxistina mafên xwe ji dest bidin.” ((Apê Osman Sebrî 1905-1993)).

Pêvajoya danûstandinên Kurdî-Kurdî, piştî hatina serokê nû yê Amerîkayê Joe Biden û guhertina rêveberiya Washington bi carekî hate rawestandî û berovajî ku nakokiya siyasî di navbera herdu aliyê danûstandinkar de (ENKS, PYNK) dijar û zêdetir bûn, û pêvajoya danûstandinên yekrêziyê ket di metirsiyek mezin de.

Ev yek aşkere dika ku danûstandin bisernajeve bêtî nebûna givaştinên mezin ji aliyê Amerîka ve, ku di derheqa vê mijarê de, şirovekarê siyasî yê kurd, Dr. Azad Ehmed Elî di gotarekî de di bin navê metirsiya paşguhxiştina danûstandinên Kurdî-Kurdî ji hêla Amerîkayê ve belav kir û tede bal kişadiye li ser girîngiya givaştên Amerîkî li ser aliyên Kurdên Rojavayî ji bo serxistina pêvajoya yekrêziya kurdî, û dide zanîn ku serxistina pêvajoya siyasî li Rojavayê Kurdistanê dê bibe kilîta çareseriyê li tevaya Sûriyê û wê bibe platformek ji bo aktîvkirina pêvajoya çareseriyê siyasî li Sûriyê, berovajî vê yekê wê Sûriya bibe meydana destwerdana herêmî û navnetewî û dubarekirina veberhêna terorîzmê.



Kenneth R. Rosen jî ji Enstîtûya Washington û rojnamevanê Newsweek, di 21'ê nîsanê gotarek di bin navê danûstandinên yekîtiya kurdên bakurê rojhilatê Sûriyê di metirsiyê de ye belav kir û tede gotibû ku Wezareta Karûbarên Derve ya Amerîkî dixwazê ku desteyek Kurdî ya bihêz û yekgirtî peyda bike ji bo bikaribe biryara Netewên Yekbûyî bicih bike û çareseriyê siyasî ji bo şerê navxweyî li Sûriyê yê berdewam ji çend salan ve peyda bike.

Hêjayê gotinê ye ku li vê dawiyê careke din Amerîka daxwaza destpêkirina danûstandinên Kurdî-Kurdî dika, û ji aliyê balyozê nû yê Amerîkî li Sûriyê, David Brownstein, çend hevdîtin li gel herdu aliyê kurdî hatine pêkanîn û li gel aliyên kurdî pêdagirî li ser berdewamiya danûstandinên kiriye û yekser daxwaza yekrêziya wan kiriye ji bo beşdarîkirina kurdan di danûstandinên aştîyê yên di bin sîbera NY de.

Şandeke Amerîkî ya bi seroktîya Alîkarê Wezîrê Derve yê Amerîka Joey Hood, piştî serdana Hikûmeta Herêma Kurdistanê, serdana Rojavayê Kurdistanê jî kir, û Wezareta Derve ya Amerîkayê di 17ê gulanê de bi daxuyanîyeke fermî aşkere

kir ku wê şandeyê di 16ê mehê de serdana Bakurê Sûriyê kir.

Li gorî nûçeyê VOA kurmancî: “di daxuyanîyê de ku cara yekê ye, tîkildarî serdana şandeke siyasî ya Amerîka ya ji bakurê Sûriyê re, di malpera Wezareta Derve ya Amerîka de tê weşandin.

Di daxuyanîyê de hate gotin ku şande ji Alîkarê Wezîrê Derve yê Amerîka yê Demkî Joey Hood,

Cîgira Alîkarê Wezîrê Derve û Nûnera Taybe ya Karûbarên Sûriyê Aimee Cutrona, Cîgirê Şanderê jîbo Sûriyê David Brownstein û Dîrektorê Civata Ewlekarîya Neteweyî ya Qesira Sipî jîbo karûbarên Îraq û Sûriyê Zehra Bell pêk hatiye”.

Herwiha VOA Kurmancî daye zanîn ku çavdêrên siyasî bal dikşînin ku cara yekê ye ku şandeyê Amerîkî di vê astê de bi rengekî aşkere serdana bakurê Sûriyê dika.

Li pêş çavê me ye, heger yekrêziya kurdan hebe, Efrîn, Girî Spî û Serêkaniyê nedihatî dagîrkirin, herwiha şerê vê dawiyê li Qamişlo di navbera HSD û çeteyên Difa'î Wetenî de

û xwepêşandanên 18-19ê gulanê yê li dijî bilindkirina nîrxê sûtemeniyê aşkere dika ku pêdiviya Rêveberiya Xweser bi beşdariya hemû aliyên Kurdî heye bi taybetî bi beşdariya ENKSê wekî hêzeke mezin li ser astên cewawerî, siyasî, diplomasi û leşkerî heye nemaze ku niha mîletê kurd di rewşeke mirovî û aborî xirab de derbas dibe.

Ji aliyekê din, xuyaye ku rejîma Sûriyê bi alîkariya Rûsiya wê helbijartinên serokatîyê li Sûriyê di 26'ê gulanê de encam bide û wê Bişar Esed ji bo heft salên din bimîne serokê Sûriyê, bi taybetî ji ber nebûna opozisyoneke alternatîf.

Di derbarê vê mijarê de, bi dîtina mim ku Amerîka li hember projeyên Rûsiyayê-Rejîmê, Tirkîyê-Opozisyona Îslamî, dixwaze rêveberiyê baş pêşkêş bike ku bibe nemûneyek pêşkevî ji bo çareserîkirina krîza Sûriyê ku tede mîletê kurd rolekî serekî di siberoja Sûriyê de hebe, û bibe hevpar di desthilatê Sûriyê de, tevî bi texmîna min ku niha danûstandin ji bo tînekirina pîrsa kurdî bi awayekî veşartî bi çavdêriya Rûsiya, Tirkîye û Îranê di navbera Rejîmê û Opozîyonê dibin.

Salek bi ser îdamkirina şehîd Hidayet Ebdullapûr re derbas bû

Roja Şemî 20ê Banemera sala 1399an bû, wate salek berî niha şehîd “Hidayet Ebdullapûr” girtiyê siyasiyê Kurd di girtîgeha bajarê Urmîyê de bo cihekê nexuya hate veguhashtin û du roj piştî veguhashtina wî, roja Duşemî 22ê Banemera heman salê, di yek ji padiganên bajarê “Şinoyê” de hate tîrbarankirin.

Îdamakirina “Hidayet” zalimane û nemirovî bû, û meşa pêdaçûn bi dosiyeya “Hidayet” di navendên dadresî yên rejîma Îranê de jî, bi awayekî nadadperwerane û bi binpêkirina yasayên mafê mirovê bû, û ew cezaya ku bi ser wî de hatibû sependin gorî dosyeya wî nemirovî bû.

Cezaya îdamkirina “Hidayet” carekê ji aliyê dîwan bilind a rejîma Îranê ve hatibû hilweşandin, lê dadgeha bajarê Urmîyê caraek din bi bê berçavgirtina biryara dîwana bilind a rejîma Îranê cezaya îdamê bi ser wî de sepend. Ew ceza bi bê paraştina yasayên dad hatibû sepan-

din û di vê derheqê de şehîd “Hidayet” û malbata wî bi taybet “Ebubekir” bavê wî digel parêzerê wî li derheqê cezayê nerzayeti nîşan dan û biryar bûn ku ew ceza bê hilweşandin, lê navendên ewlehiyê bi kontrolkirin û tîketin neyasayî di nava dosiyeya wî de, rê ji hilweşandina wê biryarê girtin.

Piştî sependin û rêgirîkirin ji hilweşandina yasayî a cezaya şehîd “Hidayet”, dadsitanê bajarê Şinoyê jî, rê neda ku parêzerê Hidayet ji naveroka dosiyeya wî agehdar be û tev meşa pêdaçûn bi dosiyeya û biriyara dîwan bilind re bi bê beşdariya parêzerê wî hate encamdan.

Piştî veguhashtina şehîd “Hidayet” bo ciheke nexuya malbata wî û parêzerê wî bo heyama du mehan ji çarênivîsa Hidayet bê ageh bûn û her car serdana navendên pêwendîdar dikirin, ti bersivêk serast nedidane wan û ew raştî bîrêzîkirinê jî dihatin.



Îdamkirina “Hidayet” cudahiyeke digel îdamên din hebû, ew li mafê dawî hevdîtin digel malbata xwe bêpar bû, û malbata wî jî, wekî malbata qurbanîyek din ji wergirtina termê lawê xwe bêpar man.

Li ser dosiyeya şehîd “Hidayet Ebdullapûr” çendîn car çendîn navend û saziyên cîhanî û navnetewî yên mafê mirovî û aliyên pêwendîdar hatine deng û daxwaza rohnkirinê li rejîma Îranê kirine, lê rejîm wekî cinayetên xwe yên din bédeng ma.

Di vê derheqê de Navenda Mafê Mirovî a “Kurdpa”yê jî, bi hilkefta salvegera şehîdkirina “Hidayet” daxuyaniyek belav kiriye û di daxuyaniya xwe de hin zaniyariyên nû li ser dosiyeya navbirî belav kiriye.

Rewşa tendirustiya qurbanîyek mînê xirab e



Qurbanîyekî mînê yê bi navê “Ebdullah Serefraz” ku bi sedema teqîna mineke rejîma Îranê birîndar bibû bo nexweşxaneyek li bajarê Urmîyê hatiye veguhashtin

Ew welatîyê Kurd ku temenê wî 22 Sal e û xelkê gundê “Tuwe” yê ser bi bajarê Serdeştê ye, bi sedema teqîna mineke rejîma Îranê bi dijwarî birîndar bibû û bona çareserîya pizîşkî bo nexweşxaneyek bajarê Urmîyê hatiye veguhashtin û pêka gotina duktoran, rewşa tendirustiya wî welatîyê Kurd xirab e û niha li beşa “ICU”ê

de hatîye razandin. “Ebdullah Serefraz” li 22ê Banemerê li nêzî gundên “Binew Xelef û Tuwe”yê bi sedema teqîna mineke rejîma Îranê bi dijwarî birîndar bibû û li deştêpêkê de bona çareserîya pizîşkî bo nexweşxaneyek bajarê Serdeştê hatibû veguhashtin.

Teqîna min bûye sedem ku deşt û pê, demûçav û zikê “Ebdullah Serefraz” bi dijwarî birîndar bibe. Ew welatîyê Kurd bona çêrandina ajelên xwe raştî teqîna mîneke rejîma Îranê hatibû.

Rejîma Îranê bi mînrêjkirîna piraniya deverên li navbera Rojhilat, Başûr û Bakûrê Kurdistanê bûye sedem ku xelkê wan deveran bi taybet xwedîyên ajelan tûşî teqîna wan mînan bibin ku xisarên giran ên canî û malî li pey xwe anîne.

Rojnamevanek xelkê Îlamê ji aliyê rejîma Îranê ve hate binçavkirin



Rojnamevanê xelkê Îlamê Ryê bi navê “Emîn Mihemedî” ji aliyê dadseraya bajarê Sîrwanê ve hate binçavkirin.

Pêka nûçeya Ajansa nûçegihanîya “Kurdpa”yê, roja Duşemî 17ê Gulanê, nûçegihanê “Heyeta Çapemenî li Îlam”ê, “Emîn Mihemedî” bi sedema tomarkirina sikaleyakê li navendeke kevin a rejîmê, li bajarê Sîrwan li parêzgeha Îlamê hate binçavkirin û ew binçavkirin bi nûneratiya dezgeha Dad a rejîma Îranê ve hatiye cîbicîkirin.

Ew rojnamevanê Kurd ji aliyê tîmeke taybet ve û li ser biryara dadwerê wê dadgehê ve hatibû binçavkirin û pêka gotina dadgeha bajarê Sîrwanê, binçavkirina “Emîn Mihemedî bi nûneratî ji dezgeha Dad ve bûye û ti pêwendîyek bi dadgeha wî bajarî ve nîne û bi tenê wê dadgehê biryara dezgeha Dad cî bi cî kiriye.

Binçavkirin û îşkencekirina rojnamevanan li Rojhilatê Kurdistanê de ji aliyê dezgeha Dad û Spaha Pasdaran û navendên din ên ewlehiyê û leşkerî, dide xuya ku azadiya gotin û çapemenîyan bi taybet li Rojhilatê Kurdistanê de roj bi roj bertengtir dibe û rejîma Îranê yek ji wan welatan e ku zêdetirîn binçavkirin û îşkencekirina rojnamevanan heye û rejîma Îranê bilintirîn pile li sînordarkirina azadiya çapemenîyan li cîhanê de heye.

Ji Terîqeta Xelwetiye Helbestvanek: Şêx Şemseddîne Qutbê Xelatî

N: Occo Mahabad

Şêx Şemseddîne Qutbê Xelatî di wêjeya Kurdî de yekemîn helbestvanê Terîqeta Xelwetiye ye. Şêx Şemseddîn di sala 1588an de li Xelata Bedlisê tê dinyayê. Malbata wî girêdayî binemaleke navdar û rewşenbîr e ku ji Hemedanê koçî Xelatê kirine. Ew bi koka xwe digêhe Şêx Huseynê Exlatî yê navdar û rêzdar. Xwendina xwe ya pêşî li cem bavê xwe Seyîd Ebdulkerîm distîne. Wekî şagirtên din xwendina xwe bi destê çend mamosteyan didomîne. Piştî perwerdeya xwe ya bi salan îcazeta xwe ya olî û zaniştî hildide, dibe yek ji alimê zemanê xwe. Ji ber sedema şerê di navbera Osmanî û Safeviyan bi bavê xwe Seyîd Ebdulkerîm û birayê xwe Mihemed Emîn re Xelatê terk dikan û diçin Hekariyê li ba eşîra Doskiyan bi cih dibin. Di wê demê de Mîrê Hekariyê Îmadeddîne Hekkarî ye ku hukm û desthilatdariya wî heya sala 1639an berdewam kiribû.

Em zanin ku giregirên malbata Xelatî ku ji Hemedanê koç kiribûn girêdayî Terîqeta Sehrwerdî bûn. Seyyîd Elî Hemedanî ku ji bine-mala Şêx Şemseddîn e li Rojhilatê Kurdistanê Şêxê Terîqeta Sehrwerdî bû. Ji ber xizmetên wî yên kirî li Xorasanê jê re gotine “El-Muvahhidû'l-Xorasanî.” Ji ber vê Tekyaya Brîfkanî ku ji aliyê Şêx Şemseddîne Xelatî ve hatibû damezrandin wek cihê Terîqeta Sehrwerdî jî tê dîtin. Lê em baş zanin ku Şêx Şemseddîne Xelatî di herêma Brîfkanê de damezrîner û belavkerê Terîqeta Xelwetiye ye.

Koka termê Xelwetiye li cihekî xalî ji tenêmayîne tê. Yek ji terîqetên herî mezin e di nava Cîhana Îslamê de. Bawermendên vê terîqetê ji bo ku xwe gunehên dinyayê biparêzin û bibin mûmînekî baş, xwestine ku li cihê bêdeng û xalî bijîn, îbadetên xwe di nava aramiyekê de



bikin. Tê angaştin ku ev bawerî cara ewil ji aliyê Omer el-Xelwetî ve hatiye damezrandin û belavkirin.

Şêx Şemseddîn di seferekê de bi Ertûşîyan re diçe Imadiyeya paytexta mîrnişîniya Behdînan û bi mîrê wê demê Seydî Xan re têkiliyên xurt çêdike û dibe doştê wî. Mîr dibîne ku Şêx Şemseddîn merivekî zana û oldarekî bawermend e dixwaze di vê derê de bi cih bibe, bi xebatên olî, xelkê deverê bike xwedî xwendin û ilm lewma heft gundên eşîra Mizûriyan wek diyarî dide Şêx Şemseddîn. Gundê Brîfkan, Gelî Riman, Bazîdkê, Bêgeh, Rikava, Aluka û Tildêbê ew gund in ku diyarî Şêx Şemseddîn hatibûn kirin. Şêx Şemseddîn heta mirina xwe li Brîfkanê jiyana xwe derbas dike. Pênc kurên Şêx Şemseddîne Xelatî çêdibin. Her pênc kurên wî jî mirovên zana û rewşenbîr in, rêz û hurmeteke mezin ji aliyê xelkê deverê ve dibînin.

Şêx Şemseddîn li Brîfkanê bi cih dibe û li wir di sala 1621ê de tekyayeke Xelwetî ava dike. Şêx Şemseddîne Qutbê Xelatî bi qasî 53 salan li Brîfkanê di tekyaya xwe de wezîfe kiriye, ilm û irfana xwe bi xelkê deverê re parve kiriye. Di sala 1674an de 88 salî bûye li Brîfkanê jiyana xwe ji dest daye. Îro gora wî ji bo xelkê deverê cihekî pîroz e wek mezergehekê tê ziyaretîkirin.

Şêx Şemseddîne Xelatî zanayek û sofîyekî navdar, helbestvanekî jêhatî bû, wî helbestên xwe bi kurdî, erebî û farisî nivîsandine. Şêx Şemseddîne Qutbê Xelatî di hinek helbestên xwe de wekî

Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran peyvên Tirkî bi kar anîne. Tê dîtin ku Şêx Şemseddîn di helbestên xwe de mexlesên Xelwetî û Sûfî bi kar anîne. Bi vî awayî diyar dike ku girêdayî bawerî û rêya Xelwetiye ye.

Dîwaneke wî heye tê de 16 helbest û du helbestên netemambûyî hene. Helbestên wî ji aliyê Şêx Memdûhê Brîfkanî ve hatine berhevkirin û parastin. Şêx Memdûh di sala 1940an de dest bi komkirin û nivîsandina helbestên Şêx Şemseddîn dike û piştî xebata 26 salên şûn de di sala 1966an de karê xwe temam dike.

Helbestên Şêx Şemseddîn cara pêşî bi hewlên Zahîd Brîfkanî li Swêdê ji aliyê weşanxaneyê Roja Nû ve bi navê Dîdarê Yar di sala 2001ê de tîn çapkirin. Çapa duyemîn ya vê berhemê di sala 2001ê de li Hewlerê ji aliyê Weşanxaneyê Arasê bi pirtûkeke 70 rûpelî derdikeve. Çapa sêyemîn di sala 2002yan de dîsa li Hewlerê û ji weşanxaneyê Arasê derdikeve.

Şêx Şemseddîn, hemdemê Mela Ehmedê Cizîrî û Feqiyê Teyran e lê heya niha qedrê wî baş nehatiye zanîn. Şêx Şemseddîn, bi baweriya wahdetu'l wucûde gellek helbest nivîsandine. Ev bawerî di helbestên wî de eşkere tî dîtin.

Ez ku meştê meyê îşq im te ne nâ hâ yâ hû
Mîsr û Bexda û Dimeşq im te ne nâ hâ yâ hû

Âşiq û deng im û kâs im melek û cîn im ve nâs im
Xeyrê vî kesê dî nenâs im te

ne nâ hâ yâ hû

Mezherê zât û sîfat im
me'denê eynê heyât im
Keştiyê Nûh û necât im te ne nâ hâ yâ hû.

.....

Piraniya helbestên wî li ser mijarên olî û sofîtiyê ne. Helbestên wî yên li ser mijarên eşq û tesewûfê pir rengîn û herikbar in. Ew di helbesta xwe ya Derdê Îşq de dijarî û eşa dilê xwe bi xemgînî û bêcaretiyeke mezin aniye zimên.

Derdê Îşq
Alem eger çi qal dikan, ezê bêjim ji derdê îşq
Qetlim eger helal dikan, ez dibêjim ji derdê îşq
Mûnkirî vê ji mêjin ew, ji dîrîyê dibêjin ew
Xûnim eger dirêjin ew, ez dibêjim ji derdê îşq
Ji derdê îşq evan dibêm, zahire hem eyan dibêm
Sîrrê xefî beyan dibêm, ez dibêjim ji derdê îşq.

.....

Mijara eşq û eş wekî hemû helbestvanên klasîk li ba Şêx Şemseddîn jî girîng û pîroz e. Eşq carinan bi hebûna Xwedê re carinan bi tunebûna dermanan re hatine honandin. Di eşqa Şêx Şemseddîn de fidekarî, wêrekî û baweriyeke teqez tê dîtin. Ew dizane ku bîyî eşq mirov kêr e mirov nebaş e lê eşq jî zor e bi derd, elem û keder e.

Xemê Îşqê
Dîsan ji xemê îşqê, ez bê hiş û bê bîr im
Mecnûn im la ye'iqîlû, dîn û bêhiş im
Îşqê ku peyda bûye, aqil ji serê min birye
Bê nav im û bê deng im, bê 'ar im û rûswa me.

.....

Şêx Şemseddîn yekemîn helbestvanê Terîqeta Xelwetiye ye ku di dawîya sedsala 16an heta sedsala 17an jiyaye. Şêx Şemseddîne Qutbê Xelatî bi hewl û xebatên xwe yên edebî û ilmî li her deverê Kurdistanê deng vedayê di dilê xelkê xwe de her tim bi rêzdarî jiyaye.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Pênc çalakvanên medenî li bajarê Sinê hatine binçavkirin

Roja Sêşemî 28`ê Banemerê, 5 çalakvanên medenî yên bi navên “Murtiza Mihemedî”, “Keywan Elyasî”, “Riza Rizayî”, “Qani`i Xatirî” û “Muhsin Husênpenahî”, ên xelkê bajarê Sinê, ji aliyê hêzên ewlehî ve hatine binçavkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, hêzên ewlehî bi bê hebûna ti belgeyeke yasayî êrîşî kirine ser mala wan 5 welatiyan û ew binçavkirine.

Herwisa wê çavkaniya agehdar ragihand: “Ew 5 çalakvanên medenî şeva Dûşemî 27`ê Banemerê, bi rêya telefonê bo îdareya Îtla`ata bajarê Sinê hatibûne gazîkirin.

Heya niha lipeyketina malabatên wan 5 welatiyan li derheq agehdarbûn ji qedera wan, bê encam maye.

Ew 5 çalakvanên medenî li kempêynên sîvîl ên bajarê Sinê de çalak bûne. “Qani`i Xatirî û Muhsin Husênpenahî”, endamên kempêyna “Jiyaneveya Kurdistan”ê ne.

Heya dema belavbûna vê nûçeyê ji sedema binçavkirin û tohmêtên ku bi ser wan 5 çalakvanên medenî de hatiye sepandin, ti zanariyek li ber deşt de nîne.

Kolberekî Kurd li ser sînorê bajarê Banê hate birîndarkirin

Roja Duşemî 27`ê Banemerê, kolberekî Kurd yê bi navê “Ebdullah”, bi sedema teqeya raşterast a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê “Zile”yê ser bi bajarê Banê hate birîndarkirin.

Hêzên leşkerî, bi bê agehdarkirina berê teqe ji wî kolberê Kurd kirine.

Di wê bûyerê de, lingê Ebdullah bi awayekî dijwar birîndar bûye û bo tedawiya pizîşkî bo yek ji nexweşxaneyên bajarê Banê hate veguhasîn.

Her di wê derheqê de, roja Duşemî 27`ê Banemer, kolberekî Kurd yê bi navê “Yûsif Emînî”, xelkê gundê “Nenûr” a ser bi bajarê Banê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê “Bîrwêşkanî” ser bi wî bajarî, hatiye birîndarkirin.

Girtiyek li girtîgeha bajarê Îlamê hate îdamkirin

Pêka rapora nûçegihaniya “Hêrana”yê, sibeha roja Yekşemî 26`ê Banemerê, cezaya îdamkirina girtiyek ê bi navê “Cemal Mihemedî”, bi tohmeta “qetîl”, li girtîgeha Îlamê hate cîbecîkirin.

Nûçegihaniya “Hêrana”yê ragihaniye: Ew girtiye bi amadebûna malbata kuştî hate îdamkirin û navbirî nêzî 2 sal berî niha di dema serbazîkirina bi zorê de, li yek ji padiganên bajarê “Îlam”ê li encama pevçûn û şer digel berpisê xwe, navbirî kuştibû.

Ew girtiye, ji aliyê dezgeha dadwerî ve bi tohmeta “qetîl” bi îdamê hatibû cezakirin.

Heta dema belavbûna vê nûçeyê, îdamkirina Cemal Mihemedî, ji aliyê mediyyên navxweyî yên Îran û çavkaniyên fermî re nehatiye ragihandin.

Penaberekî Rojhilatê Kurdistanê li ber deriyê “UN”ê li Hewlêrê agir berda cestê xwe

Roja Sêşemî 28ê Banemerê, du penaberên siyasiyên Kurd ên bi navên “Bêhzad (Mihemed) Mehmudî” xelkê bajarê Bukanê û “Ferdîn Gîramî” xelkê bajarê Nexedê li ber deriyê ofîsa nûneratiya Saziya Netewên Yekgirtî li bajarê Hewlêrê, man girtibûn.

Di vê mangirtinê de “Bêhzad Mehmudî” bi sedema wê yekê ku ji aliyê vê Saziyê ve bersiva wî nehatiye dan, agir berdaye cestê xwe.

Ew du penaberên siyasî ku li ber deriyê ofîsa Saziya Netewên yekgirtî li bajarê Hewlêrê bi sedema bersivnedan bi daxwazên wan ji aliyê wê rêxiravê ve, mangirtibûn bi nûçegihanan ragihandine ku dîsa jî bersiva wan nehatiye dan.

“Bêhzad” piştî agirberdan bi cestê xwe bi rêjeya %90 şewitiye û bo nexweşxaneyê “Îmêrcênsî” li bajarê Hewlêrê hate veguhasîn.

Agirî

- ◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdistanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (398)



NA BO DENG DAN